Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :832 24-Çile- 2021 Rojnameya Siyasî û Çandî

Meclisa Rêveber civîna xwe ya salane ya 2. bi dawî kir

Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê civîna xwe ya salane ya 2. bi diyarkirina plansaziya îsal ya qada siyasî, xizmetgûzarî, leşkerî û rêveberiyê bi dawî kir.

Desteya Serokatiya Rêveberiya bakur û rojhilatê Sûriyê, Hevserokatiyên Rêveberiyên Xweser yên 7 Rêveberiyên svîl yên bakur û rojhilatê Sûriyê, hevserokên desteyan û nivîsgehên Rêveberiya Xweser û Serokatiya Desteya Rêveber ya MSD`ê Îlham Ehmed beşdarî civînê bûn.

Hevseroka Meclisa Rêveber Bêrîvan Xalid gelek proje, pêşniyarên hatîn kirin û palana xebatê ya 2021'ê eşkere kirin.

Plansazî wiha ye:

Di qada siyasî de

-Ji bo çareseriya aloziya Sûriyê li gorî daxuyaniyê Cinêvê û biryara NY`yê 2254 kar û xebatên siyasî werin berdewamkirin.

-Wê xebata jinûve nirxandina damezrandina desteyên ku nûnertiya gelê Sûriyê di civîna Cinêvê û destûra bingehî ya Sûriyê de bike, were kirin.

-Di çarçoveya çareseriya siyasî de ya ji aloziya Sûriyê re hewldana qezenckirina îtîrafeke siyasî ya bi Rêveberiya Xweser ve were kirin, piştgiriya ji diyalogên kurdî-kurdî re were kirin û di çarçoveya diyalogên sûrî-sûrî de be.

Di qada ewleyî û leşkerî de

-Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê parastina ewlehiyê û aramiyê were kirin.

-Parastina Yekîtiya xaka Sûriyê were kirin.

-Herêmên ku dewleta tirkî û çeteyên wê dagîr kirîn werin rizgarkirin.

-Pêşxistina rêgeza parastin, xweparastin û berxwedana li hember êrişên derve.

-Wê destkeftiyên gelên bakur û rojhilatê Sûriyê werin parastin.

-Piştgirî ji saziyên ewlekariyê re were berdewamkirin da ku şaneyên DAIŞ`ê têk bibin, aştî misoger bibe û diyardeya têkbirina çanda civakan betal bibe.

-Divê saziyên ewlehiyê girêdayî qanûnan bin û hikmên dozgeriyê bi cih bînin.

Di qada rêxistinkirin û xebata rêveberiyê de

-Xebata rêveberiyê were pêşxistin, li gorî peymana bingehî ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê jinûve sazmûmaniya Rêveberiya Xweser were kirin, sazmûmaniyên hemû desteyan û nivîsgeh û rêveberiyan li gorî sîstema hûndir werin berdewamkirin.

-Wê nivîsgehên plansaziyan, geşkirin, serjimariya navendî û şaxî werin pêşxistin û aktîfkirin.

-Di nava saziyên Rêveberiya Xweser de cîhazên çavdêriyê werin aktîfkirin û kesên pispor tê de bixebitin û li dijî hemû şêwazên gendeliyê tê bikoşin.

-Di saziyên Rêveberiya Xweser de kadroyên tenduristiyê werin amadekirin ev jî bi rêya vekirina perwerdeyên pîşesaziyê dê pêk were.

-Civîn ji gel re werin çêkirin, da ku azarên wan werin çareserkirin.

-Wê xebata rêxistinkirina qanûn, giştîname û biryarên rêveberiyê werin şopandin, da ku xebata li saziyên Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê hêsan bibe.

-Xebata li ser şopandina dozan were kirin, da ku bûrokrasî sivik bibe û bar li ser şêniyan kêm bibe.

-Wê xebata rêvebirina li dezgehên çapemeniyê were pêşxistin.

-Kar û xebata nûnerên Rêveberiya Xweser ên li derve were pêşxistin û hewldana xurtkirina têkiliyên bi dewlet, rêxistinên civaka sivîl, akademî û partiyên siyasî re were kirin.

-Ji bo piştgiriya projeya erka xweparastinê kar û xebat were kirin û erka parastina bibe erka herî pêş a 7 Rêveberiyên Xweser û Sivîl.

-Di rêveberiyan de kadroyên jin werin avakirin û di qada siyasî û rêveberiyê de werin perwerdekirin.

-Bi rêya perwerde, avakirina kadro û peydakirina pêwîstiyan girîngiyê bidin qada ewlekariyê.

-Ji bo avakirina xweseriyekê û xwetêrkirinê planên geşkirinê werin danîn.

Di qada xizmetgûzarî û binesaziyê de

-Divê girîngî ji bo projeyên xizmetgûzariyê yên girêdayî binesaziyan bê dayîn, ji wan zifitkirina rêyan, sererastkirina piran û danîna torên avê, kanalîzasyon û torên kehrebê.

-Divê bi rêya sererastkriina nexweşxane, navendên tenduristiyê, dabînkirina pêdivî û amadekarî û avakirina nexweşxaneyên taybet ên nû, piştgirî bê dayîn û li hember pandemiya vîrusa Koronayê tedbîr bên girtin.

-Piştevaniya qada fêrkirin û perwerdeya bilind bê kirin û xebata sererastkirina dibistan, avakirina dibistanûnên nû, yekkirina meteryal û dabînkirina pirtûkên dibistanê, were şopandin.

-Plansaziyên rêxistinî li gorî hewcedariyan werin berfirehkirin û avakirina bêserûber were sînordarkirin.

-Herêmên pîşesazî û sînaî li gorî pêwîstiyan werin avakirin.

-Girîngiyê bidin avahiyên werşîzê û avahiyên nû werin çêkirin her wiha navendên geşkirina pîşeyên ciwanan ên li tevahiya herêman werin vekirin.

-Piştgiriya ji qadên çandê, tûrîzm û şûnwaran re were kirin, da ku parastina keleporê were kirin û berdewamkirina belgekirina sûcên ku li dijî şûnwaran tên kirin û van sûcan ji aliyên peywendîdar re werin şandin.

-Hejmara firinan were zêdekirin da ku pêwîstiyên welatiyan ên nan were çareserkirin.

-Parastina Jîngehê were kirin û ji bo derbaskirina pirsgirêkên qirêjiyê çareserî were dîtin.

-Rûberên darçandinê û deverên keskayîyê yên li herêmên zuha werin zêdekirin da ku rê li pêşiya çolistanê bigirin.

Di qada projeyên geşkirinê de

-Teşwîqkirin û dabînkirina hewayeke guncaw ji bo proje û îstîsmarên taybet hebe, da ku xwe bigihînin dabînkirina debarê.

-Qadên hilberînê werin pêşxistin da ku derfetên kar ji welatiyan re çêbibe, pêwîstiyên welatiyan werin dabînkirin û bi nirxekî guncaw be .

-Qada çandiniyê were pêşxistin û pêwîstiyên cotkaran werin peydakirin, ji wan tov, dermên kêçan û parastina sewalkariyê.

-Projeyên aborî û xizmetgûzariyê yên giştî û taybet bi jinan werin kirin.

Ji bo Malbatên Şehîdan, kampan û kar û barên mirovî

-Xebata goristanan were berdewamkiirin û girîngiyê bidin zarok û malbatên şehîdan.

-Girîngiyê bidin kar û barên kampan û rewşa koçberan baş bikin û bi hemû derfetên xwe ji bo vegera wan a li malên wan kar û xebat werin kirin.

-Girîngiyê bidin dosyên mirovî û wekî ku dosyek bi tenê ye were dîtin û piştgiriya nivîsgehê were kirin ku stratejiyê pêk bîne.

-Navendên xwedîkirina sêwî û astengdaran werin avakirin.

HRE: Di berxwedana li dijî dagîrkeriyê de, ser 900î re dagîrker hatin kuştin

HRE got; emê di sala nû de berxwedanê xurttir bikin û bersivên pir giran bidin mêtînegerên welatê me dagîr kirîn. Di vê berxwedanê de heta niha ser 900î re dagîrker hatin kuştin.

Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) bi pêmana salvegera 3. ya destpêkirina dagîrkirina kantona Efrînê daxuyaniyeke nivîskî da. Daxuyanî wiha ye:

"Dewleta tirkî ya dagîrker 20'ê Çileya 2018'an, bi hevkariya hêzên li hemberî êrişan çavê xwe girtîn, dest bi êrişa Efrînê kirin. Li hemberî wan êrişên hovane ji 7 heta 70 salî gelê me di nava berxwedanê de cî girt û berxwedaneke bêhempa kir. Ji bo şeref û rûmeta xwe bedelên pir giranbiha û mezin dan.

3 sal di ser dagîrkirinê re derbas bûn. Di van 3 salan de dewleta tirkî ya dagîrker bi awayekî dijmiroî êrişên xwe domandin û xwest gelê me tine bike. Herwiha ji bo ku erdnîgarî û dîroka herêmê tine bike di nava hewldanan de ye. Dixwaze demografiya herêmê biguherîne û dîroka wê tine bike. Lê îro gelê me yê li gund û navçeyên bajarê Efrînê dimîne li hemberî hovîtiya dewleta tirkî û çeteyên wê bi helwesteke birûmet li ber xwe dide. Ji cewherê xwe, ji erdê xwe, ji dîroka xwe qut nabin û ji bo wê çi bedel pêwîst be tê dayîn. Em dizanin ku piştî dagîrkirina navçe, gund û bajarê Efrînê gelek mirovên me li ser xaka xwe man. Em zarokên gelê Efrînê û Hêzên Rizgariya Efrînê, vê têkoşîna gelê xwe ji xwe re ferman dibinin, ji gelê xwe û şehîdên xwe hêz, kelecan û moralekî mezin digirin. Ji roja destpêkirina dagîrkeriyê ve berxwedana me dewam dike û di sala nû de emê berxwedanê xurttir bikin û bersivên pir giran bidin mêtîngeran. Di vê berxwedanê de heta niha, li hemberî dagîrkeran ji 400î zêdetir çalakî hatine kirin û di wan çalakiyan de ji 900î zêdetir dagîrker hatine kuştin û herî kêm ewqas jî hatine birîndarkirin. Herwisa bi dehan seyare û cebilxaneyên wan hatine roxandin û desteserkirin.

Em Hêzên Rizgariya Efrînê bang li gelê xwe yê li gund û navçeyên Efrîn, Şehba û yên koçberên derveyî welat bûyîn dikin ku ji bo em bajarê xwe ji dagîrkeran rizgar bikin, kî li ku derê be û ji destê wan çi were bikin. Di serî de kesên sîxurtiyê dikin, yên ciwanên me direvînin, destdirêjiyê dikin, yên diziyê dikin, yên di nava civakê de tiştên nebaş dikin, li hemberî wan divê herkes bi kîn, vîn û bi baweriyeke mezin çi madî çi manewî çalakiyên xwe di sala nû de xurttir bikin. Di sala nû de divê herkes hedef û armancekê dayne pêşiya xwe û wisa têkoşîn û berxwedana xwe û dengê xwe bilind bike. Di heman demê de em bang li ciwanên xwe dikin ku tevlî Hêzên Rizgariya Efrînê bibin. Emê di sala nû de bi çalakiyên xwe bersiveke xurttir bidin dagîrkeran û emê gelê xwe yê li gund û navçeyên Efrînê mayî ji nava vê hovîtî û zilma dewleta tirkî û çeteyên wê rizgar bikin.

Divê dagîrker bizanin ku di sala nû de çalakî û berxwedana me wê bi awayekî xurttir dewam bike. Ji bo wê çi bedel pêwîst be em amade ne bidin û em didin jî. Her çiqas îro cîhan tev li hemberî kiryarên dijmirovî ku di dîrokê de hempayên wan kêm in bêdeng be jî, hêz û moralê em ji berxwedana gelê xwe û ji şehîdên xwe digirin, wê me bibe serkeftinê."

Quncika têgînan

Bac	Diravên ku dewlet di berdêla mal û milk de ji welatiyên xwe distîne: Baca xaniyan pir biha ye.
Cirm	Standina bi darê zorê ya mal, milk yan jî diravan ji mirovan: Rêbiran em cirm kirin.
Firîşte	Melek.
Koordîne (Fransî)	Ji bo xwegihandina armancekê pêkanîna girêdan, têkilî, rêxistin û ahengê di navbera çend karan de: X. karê kargehê koordîne dike. Koordînasyon.
Koordînator	Kesê karê koordîneyê pêk tîne.
Perû	Xelat, diyarî: A. saetek da B. got; ev perûya te ye.
Salewext	12 meh: X. salewext cotkariyê dike.
Seranser	Ji serekî heta serê din. Tev, hemû: Ez li seranserê bajêr geriyam.
Seresere	Xemsarî. Girîngnedîtin: X. karê xwe seresere dike.
Rojev	Tiştên dibin mijara rojê: Di rojeva me ya îro de êrişên dagîrkeran hene.

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 832 24-Çile- 2021 Rojnameya Siyasî û Çandî

Komara Kurdistanê ya Mehabadê; ezmûneke dîrokî ya birûmet

Ezmûna damezirandina Komara Kurdistanê ya Mehabadê li rojhilatê Kurdistanê, yek ji pêvajoyên birûmet yên dîroka têkoşîna rizgarî û azadiya gelê Kurd e. Herwiha geşedanên di pêvajoya damezirandin û têkçûna komarê de jî ji bo têkoşîna gelê Kurd ya demên pêş bûye ezmûn û dersên girîng. ***R-4***

Greva birçîbûnê di roja 59. de bi biryardariyeke xurt didome

Greva birçîbûnê ya ji bo şkandina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û şkandina zordariya li zindanan hatî destpêkirin, di roja 59. de didome û girtî di çalakiya xwe de bi biryar in. ***R-5***

Efrîn ya Efrîniyan e

Dikeve sala çaran ku Efrîn di binê piyê xwînxwar û dagîrkeran de dinale. Lê gelê Kurd bibiryar e ku dagîrkeran ji wî erdê pîroz biqewitîne. Bi pêmana salvegera 3. ya dagîrkirina Efrînê, Rêveberiya Xweser, QSDê, Kongreya Star û gelê Kurd ev peyam dan: "Ji bo rizgarkirna Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî û parastina destkeftiyên şoreşê, herwiha ji bo ewleyiya Rojava, em soza xurtkirina têkoşîn û berxwedanê didin." *R-4*

Dayîka Mezlûm Ebdê koça dawî kir

Sêşema borî dayîka Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê, Xezne Hac Hisên (86) li Kobanê jiyana xwe ji destê da. *R-2*

Bîlançoya 2 mehan ya êriş û berxwedana li Eyn Îsa

Bîlançoya du mehan ya êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser navçeya Eyn Îsa û berxwedana QSD'ê ya li hemberî êrişan eşkere bû. Agahiyên bilançoyê xwe dispêrin fermandarên leşkerî û berpirsên Rêveberiya Xweser. *R-5*

Li bakur û rojhilatê Sûriyê emeliya dil ya yekê

Li Nexweşxaneya Dil û Çavan ya Qamişlo emeliya dil hat kirin. Ev emelî li ser aşta bakur û rojhilatê Sûriyê ya yekê ye û bi çavdêriya bijîşkên pispor yên emeliya dil pêk hat. *R-6*

Dayîka Mezlûm Ebdê koça dawî kir

Sêşema borî dayîka Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê, Xezne Hac Hisên (86) li Kobanê jiyana xwe ji dest da.

Dayîka Mezlûm Ebdê Xezne Hac Hisên (86), di encama krîza dil de li mala xwe ya li Kobanê wefat kir.

Cenazeyê şehîd Xalid li goristana şehîdan ya Helebê hat veşartin

Bi sedan şêniyên bajarê Helebê cenazeyê endamê fermandariya YPG'ê Xalid Reşîd ku di encama nexweşiyeke giran de şehîd bûbû, spartin axê.

Welatiyan bi karwanekî girseyî cenazeyê şehîd Xalid ji Nexweşxaneya Xalid Fecer ya li taxa Şêxmeqsûd ya Helebê girt û ber bi goristana şehîdan ya li herêma Şiqeyêf ve ketin ser rê.

Di merasima li goristanê de piştî rêzgirtinê endamê rêveber yê Meclisa Malbatên Şehîdan Hacir Meho axivî û sersaxî ji malbata şehîd re xwest.

Meho diyar kir ku şehîd Xalid Reşîd têkoşîneke bêhempa meşand û li seranserê Sûriyê, bi taybetî li Efrînê bû mînak.

Piştî axaftinê, endama Meclisa Malbatên Şehîdan ya Helebê Bêrîtan Cedan wesîqeya şehadetê

xwend û radestî malbatê kir.

Di dawiya merasimê de, cenazeyê şehîd tevî tilîliyên dayîkan, hat veşartin.

Ji MSD'ê û YJKK'ê peyamên sersaxiyê ji Mezlûm Ebdê re

Karkerên cihanê, yekbin!

برقية عزاء

برقية تعزية

Hevserokatiya MSD'ê û Yekîtiya Jinên Komînist ya Kurdistanî ji bo wefata dayîka wî, peyamên sersaxiyê ji Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê re şandin.

Di peyama Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) de wiha hat gotin:

"Îro MSD'ê bi xemgînî agahiya wefata dayîka Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê Xezne Hac Hisên bihîst.

MSDê sersaxî ji Mezlûm Ebdê û malbata wî re xwest.

Peyama sersaxiyê ya YJKK'ê:

"Me bi êş û xemgîniyeke mezin agahiya wefata Xezne Hac Hisên (Yadê Xezne) ya hevjîna têkoşerê welatparêz Dr. Xelîl Ebdî û dayîka têkoşerê Kurdistanê û fermandarê QSD'ê Mezlûm Ebdê, bihîst."

Ev malbateke welatparêz ya kurdistanî ye. Bi têkoşîna şoreşgerî ya rizgariya Kurdistanê, bi mafên tevayiya gelan û neteweyên bindest û rizgarkirina wan ji destpotiyê, tê naskirin û hê jî li ser bingehê metoda şoreşgerî û tevgera şoreşgerî xebata rizgarkirina nîştimanî û civakî bê dudilî yan jî teslîmkariyê dike.

Em YJKK'ê sersaxiya malbata Ebdê ji bo wefata Yadê Xezne dikin, her wiha bi riya malbata Ebdê sersaxiyê ji jinên welatparêz û şoreşger yên li Kurdistanê, cîhanê û gelê Kurdistanê re dixwazin."

Komeke din ji malbatên ji herêma Cizîrê ji kampa Holê derketin

Rêveberiya Kampa Holê di çarçoveya pêkanîna biryara Rêveberiya Xweser de, beşa 8`an ji koçberên ji bajarên bakur û rojhilatê sûriyê rêkirin. Beşa 8`an ji 31 malbatên herêma Cizîrê pêk dihat.

Derketina koçberan ji kampê di çarçoveya pêkanîna biryara Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê de ku di civîna 10'ê Cotmeha 2020'an de, pêk tê ku di navbera Rêveberiya Xweser, Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD), Desteya Karûbarê Civakî û Desteya Hundir de hatibû lidarxistin.

Piştî ku navên malbatên dixwazin ji kampê derkevin hatin tomarkirin û belgeyên ku pêşkêşî rêveberiya kampa Holê kirine hatin piştrastkirin, roja Sêşemê beşa 8`an ku ji 31 malbatî pêk dihat ji kampê derket.

10`ê Cotmeha 2021`ê dema lidarxistina hilbijartinên Iraqê ye

Desteya Wezîran ya Iraqê bi awayekî fermî ragihand ku hilbijartinên pêşxwet wê 10`ê Cotmeha bê pêk werin.

Desteya Wezîran ya Iraqê bi fermî 10'ê Cotmeha 2021'ê roja hilbijartinên pêşwext yên Iraqê diyar kir.

Hêjayî gotinê ye ku berî niha bi-yar hatibû dayîn ku hilbijartinên Iraqê 6'ê Hezîrana 2021'ê werin lidarxistin.

Stûdyoya Stêrk TV û Çira TV ya li Qamişlo şewitî

Roja Çarşemê piştî nîvro agir girt stûdyoya Stêrk TV û Çira TV ya li Qamişlo. Hat diyarkirin ku agir ji ber temasa kabloyên kehrebeyê derketiye.

Hat diyarkirin ku roja Çarşemê di saetên piştî nîvro de agir bi stûdyoya Stêrk TV û Çira TV ya li Qamişlo ketiye. Di demeke kurt de erebeyên agirkujiyê gihîştin cihê bûyerê û agir vemirandin.

Li gorî agahiyên ji rêveberên Stêrk TV dayîn agir ji ber temasa kabloyên kehrebeyê derketiye û di encamê de ziyana madî çêbûye.

"Kiyarên li dijî şûnwaran sûcên şer in û divê sûcdar werin darizandin"

Parêzer Ismet Îbrahîm diyar kir ku kiryarên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên li dijî şûnwaran, li gorî qanûnên naveteweyî sûcên şer in û got; divê sûcdar werin darizandin.

Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li herêmên dagîr kirîn ne sûcan li dijî şêniyan tenê pêk tînin, di heman demê li dijî cihên dîrokî, mal û milkên giştî jî pêk tînin.

Di gelek raporan de sûcên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên li herêmên dagîrkirî yên li dijî cihên dîrokî hatîn belgekirin, ji wan sûcan dizî û talankirina şûnwaran in, herwiha firotina wan li sûka reş ya Tirkiye.

Parêzer û endamê Yekşîya Parêzeran ya Kobanê Ismet Îbrahîm bal kişand ser nirxên manewî û dîrokî yên cihên dîrokî û wiha got: "Dewleta tirkî bi çavekî madî li şûnwar û cihên dîrokî dinêre. Lewre dewleta piştî binketina xwe ya desteserkirina petrola Sûriyê, berê xwe da şûnwaran, da ku ya aboriya xwe ya hilweşiyayî xurt bike. "

Îbrahîm eşkere kir ku armanca dewleta tirkî tinekirina dîroka gelê Kurd yê rojavayê Kurdistanê ye.

Ismet Îbrahîm diyar kir ku peyman û lihevkirinên navneteweyî yên parastina şûnwaran hene, ji peymana Lahay bigire heta bi Cinêvê. Lê sûcên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê binpêkirina tevayiya qanûnên navneteweyî û sûcên şer in.

Li gorî peymana Lahey ya yekê ya 1954'an, divê di demên şer de milk û şûnwar werin parastin. Herwiha li gorî madeya 5'an ya peymana Lahey divê aliyê ku herêmekê dagîr dike, tedbîrên bilez yên ji bo parastina şûnwaran û milkên çandî yên wê herêmê pêk bîne.

Lê di naveroka peymana Lahey ya duduyan ya 1999'an de û li gorî madeyên wê yên 12, 13 û 14'an qedexe ye ku dagîrker milk û şûnwaran derxin derve yan jî cihên dîrokî yên li herêmên dagîrkirî vekole.

Li gorî qanûnên navneteweyî talankirin û diziya şûnwarên dîrokî sûcên şer in, herwiha li gorî qanûna navneteweyî gelek hêman ji bo parastina herêmên şûnwarî yên dîrokî hene, jê jî divê şûnwar neyên wêrankirin, dizîn û talankirin.

Îbrahîm bi lêv kir ku heta niha dewleta tirkî li gorî bendeke ji bendên parastina şûnwaran tev negeriye.

Îbrahîm destnîşan kir ku tevahî kiryarên dewleta tirkî yên li xaka Sûriyê sûcên şer in. Ji ber wê ji bo derbasbûnê, xwe spart peymana Edenê ku erêkirina wê di parlamentoya Sûriyê û Tirkiyê û heta ya NY'yê de, nîne. Parêzer Ismet Îbrahîm di dawiyê de got; divê Erdogan û çeteyên wî tevî serbazên dewleta tirkî yên li herêmên dagîrkirî, li gorî qanûnên navneteweyî werin muhasebekirin.

Binêre û fêr bibe

Piştî ku komeleyên tirkî yên li Oslo nikarîn berhema hunermenda Kurd Gelawêj Weledxanî bidin rakirin, vê carê wezareta karê derve ya tirkî bi daxuyaniyeke fermî hewl da zorê li rayedarên Norwêcî bike ku hunerê Weledxanî rakin.

Dewleta tirkî sansûrkeriya xwe demeke dirêj e li dinyayê jî belav dike. Piştî Spanya, Slovenya û Almanya, niha jî dixwaze Norwêc ji bo wê huner sansûr bike. Sedem jî ew e ku hunermenda Kurd Gelawêj Weledxanî Mijdara borî resmekî şervanên jin yên Kurd li meydaneke giştî ya paytexta Norwêc Oslo daleqandiye. Ev wêneyê xêzkirî û rengandî wê tevayiya zivistanê jî daleqandî bimîne. Berpirsa çandê ya şaredariya Oslo di bersiva xwe de ji dewleta tirkî re got, li cem me azadiya îfadeyê heye û "Binêre û fêr bibe."

Gelawêj Weledxanî (Gelawesh Waledkhani) 7´ê Mijdara 2020´an li Oslo li ser dîwarê Rosenkrantz' Gate 14´ê wêneyekî mezin yê şervanên jin yên Kurd xêz kir. Li ser wêne portreyên gelek şervanan diyar in. Li ser wan jî nivîsa Rêber Abdullah Ocalan "A society can never be free without women´s liberation" (Civakek ti carî nikare azad bibe, bê azadiya jinê) hatiye nivîsandin. Berhem wê heta dawiya zivistanê li ser dîwarê Rosenkrantz' Gate 14´ê daleqandî bimîne. Lê dewleta tirkî xwe lê ranegirt. Wezareta karê derve ya tirkî serê xwe ji karê huner û azadiya îfadeyê ya welatekî din jî êşand û ji ber daleqandina wêne, Norwêc rexne kir. Bi vê jî nema, wezaretê ji Norwêcê û şaredariya Oslo xwest ku wê nîşandana hunerî rake.

Xwe li mala xelkê jî ranagire

Dewleta tirkî li nava erdê xwe huner û azadiya îfadeyê pêşî kezixand û paşê jî ji binî ve birrî. Jixwe, eger mesele Kurd bin mirov êdî hew dikare behsa ti azadiyan bike. Bi siyaseta dagîrkirina şaredariyan jî çi tişta berê hatî kirin, hewl dide tine bike. Ev jî têra wê nake, serê xwe bi huner, azadiya îfadeyê û azadiya huner ya li welatên din jî diêşîne. Bi sponsoriya Ajansa Huner Mesêné ya li paytexta Norwêc Oslo û destek û destûra şaredariya Oslo, berhema Gelawêj Weledkhanî Mijdara borî li ser dîwarê Rosenkrantz' Gate 14´ê hat daleqandin. Ev pêşangeheke li derve û yek berhemî bû. Navê pêşnagehê jî "Rojava: Şoreşa Jinê" ye. Kurator û spornsorên pêşangehê, gava behsa berhemê dikin, van gotinên Carne Ross ya rojnamevan yên ji sala 2017´an jî bi bîr dixin: "Rojava şoreşa femînîst ya yekê ya dinyayê ye".

Siyasetvan wê sansûr nekin

Li ser berhemê ev gotinên Ocalan hene: "Civakek ti carî nikare azad bibe, bê azadiya jinê"

Sedema wê jî ji terîfa Gelawêj Weledxanî ya ji bo Ocalan eşkere dibe: "Pratîkkerê şoreşê, îdeolog û nivîskar Abdullah Ocalan". Nexasim karê Ocalan yê îdeolojîk û damezrandina Jineolojiyê ilham daye wê.

Niha em nizanin ka wê hikûmeta Norwêcê çi bibêje, lê ji şaredariya Oslo Seroka kar û barê çandî ya Meclisa Şaredariyê, Eivor Evenrud di ser hesabê xwe yê twitterê wiha bersiv da: "Merheba Tirkiye! Li Norwêcê em ji azadiya xweîfadekirinê û demokrasiyê bawer dikin. Siyasetvan nikarin wêneyekî biguherînin yan jî rakin -û wê vê nekin jî- binêre û fêr bibe."

Civaka Tirk sansûrê bi rêxistin dike

Li gorî nûçeya rojnameya Dagbladetê heta niha 80 giliyên ji ber vî berhemê hunerî yê Gelawêj Weledxanî çûne ber destê şaredariya Oslo. Seroka Rêxistina Komeleyên Tirkî li Norwêcê Hatice Luk jî di nava van de ye û ew pêşengiyê ji vî karê giliyan û daxwaziya rakirina berhemê re dike. Rêxistinê heta niha li gorî nûçeya rojnameyê 300 imze berhev kirine.

Sansur li Norwêcê ne bibandor e

Lê berevajî Almanya, diyar e ku Norwêc serê xwe li ber vê zexta li dijî azadiya fikr û huner natewîne. Jixwe, desteka neteweyî ya hunermendan Ya ji bo azadiya huner jî vê yekê nîşan dide. Rêxistinên Norwêcî Hunermendên Hunerên Dîtbarî yên Norwêcê (NBK), Civaka Hunermendên Ciwan (UKS) û Rêxistina Xêzkran Ya Norwêcê Tegnerforbundet jî destekê didin Gelawêj Weledxanî.

Dagbladet dibêje, Weledxanî ji wan re li ser daxuyaniya wezareta karê derve ya tirkî gotiye, ev berhem bi giştî têkoşîna jinan teşwîq dike, ne ya şervanên Kurd tenê ye.

Di Meclisa Şaredariya Oslo de hilbijartiyê ji çandê berpirs Omar Samy Gamal jî ji rojnameya Dagbladetê re gotiye, "Divê Oslo bajarekî germ û hewîner be û lê ji bo her kesî cih hebe."

Diyariya mezin ji Prof. Dr. Martin Van Bruinessen

Derwêş M. FERHO

Di saziyên perwerde, kultûr, siyaset û civakê de yek ji girîngtirîn xebat hebûna pirtûkxane û arşîvê ye. Ji destpêkê ve Enstituya Kurdî ya Brukselê bi vê baweriyê kar dike. Heta ji me hat di nava Enstituyê de ev xebat bi rêk û pêk hat domandin.

Xwedê bela xwe li nîjadparêz û faşîstên dewleta Turk bide. Di Mijdara 1998 de, dema serokê Tevgera Azadiyê Rêzdar A. Ocalan li Roma/Îtalya bû rêvebirên dewleta Kemalîst ferman dan alîgirên xwe û daxwaza çalakiyan di hember Kurdan de kirin. Wezîrê Karê derve yê wê demê weha bang dikir. "Hemwelatiyên me Turk li ku ne? Çima di hember dijmin û terorîstan de bêdeng dimînin?" Roja din bi qasî 300 nîjadparêz û faşîstên Turk hêrîşî Enstituyê kirin û xanî dan ber agir. Komeleya çandî ya Kurdistan û Komeleya Suryaniyan jî nesîbê xwe ji wê wahşeta Turkan stendibûn. Enstîtu û Komele di roja 17ê Mijdara 1998 de bi temamî hatibûn şewitandin.

Me di wê wahşeta Turkan de ji 5000 pirtûkan zêdetir û 80 % ji arşîvê hunda kir. Rayedarên Turk dixwaştin bi vê waşetê re darbeyek mezin li Enstituya Kurdî û komelê bixin ku hew bikaribin li ser piya bisekinin. Lê hesabê dewleta Turk negirt. Di nava 6 mehan de di hemû aliyan de Enstituyê avahiya xwe û di nav de ciyê xebatê û pirtûkxane/Arşîf ji berê baştir kir. Hêdî hêdî me beşekî mezin ji arşîva xwe li hev da hev û zor da daneheva pirtûkan ji bo pirtûkxanê. Êdî ne li ciyekî, lê li du ciyan me pirtûkxane û arşîv damezrand.

Li Brukselê û li Antwerpen. Ji wê rojê û pê ve bi hezaran kes, bi taybetî xwendekar û lêkolîner, li van her du ciyan ji pirtûk û arşîva me sûd werdigirin.

Berî çend salan rêzdar Hesen Qazî diyariyeke mezin, bi sedan pirtûkên bi zimanên cuda Pirtûkxaneya me zengîn kiribû. Wê demê min di medya de belav kiribû spasiya xwe jê re dabû zanîn.

Havîna buhurî, dîsa rêzdar Hesen Qazî têkilî bi me re çêkir û got "Prof Dr. Martin Van Bruinessen jî dixwaze beşekî hêja ji pirtûkxaneya xwe diyarî Enstituyê bike".

Pey çend têkiliyên telefon û e-mailan di 3ê meha Qanûnê de ez çûm û min ew diyariya mezin ji mala wî anî nav pirtûkxana Enstituyê. Bi sedan pirtûkên giranbiha li ser civak, siyaset û kultûra siyasî, etnografî, filolojî û gelên/etnîkên Turkiyê diyarî Enstituyê kir. Pirraniya van berheman bi Turkî ye, beşekî piçûk jî bi zimanên Ingilîzî, Kurdî, Farisî, Erebî û Kurdî ne. Xwediyê gelek berhemên zanistî, zanistê qedirbilind bi vê diyariya xwe em zengîntir kirin

Wek tê zanîn Prof. Dr. Martin Van Bruinessen xwediyê berhemên giranbuha ye. Berhemên wî ji demek zû de wek çavkaniyên zanist ji aliyê gelek lêkolîner, siyasetmedar û kesên din wek çavkanî tên bikaranîn. Wek tê zanîn, berhema Axa, şêx û dewlet têza wî ya doktora bû. Berhemên din mîna, Etno-Nasyonalîzma Kurdan dijî dezgeha dewletê, Nivîsên berhevkirî, Kurd û nasnameya wan ya siyasî, Kesê eslê xwe înkar bike haramzade ye, Kurdbûn, Turkbûn, Alewîtî: têkoşîna etnîkî û olî, … Gelek berhemên din li ser Kurdan nivîsîne. Bê goman li ser mijarên, welat û gelên din jî berhemên wî hene.

Bi rêya vê nivîsê ez dîsa spasiyên xwe ji mamosteyê hêja Prof. Dr. Martin Van Bruinessen re dibêjim. Bi sedan pirtûkên wî ji bo min û pirtûkxaneya Enstituyê xezîneyek gelekî mezin e. Temenekî dirêj, bextewar û xebatek xurt jê re hêvî dikim.

Li bakur û rojhilatê Sûriyê emeliya dil ya yekê

Li Nexweşxaneya Dil û Çavan ya Qamişlo emeliya dil hat kirin. Ev emelî li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê ya yekê ye û bi çavdêriya bijîşkên pispor yên emeliya dil pêk hat.

Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê berî niha Nexweşxaneya Dil û Çavan ava kir, da bar li ser şêniyên herêmê sivik bike. Piştî amadekariya gelek mehan rêveberiya nexweşxaneyê roja Pêncşemê emeliya dil ya yekê ya kesê 60 salî bi çavdêriya tîma tenduristiyê pêk anî.

Li gorî rêveberê giştî yê nexweşxaneyê Mihemed Elî Ebdî, tîmeke bijîşkî ya pispor çavdêriya emeliyê kiriye û emeliyê 4 saetan dewam kiriye. Ebdî diyar kir ku rewşa nexweş baş e û di binê baldariyê de ye. Ebdî herwiha got; tê payîn ku emeliyên dil yên din ji nexweşan re di çend rojên pêş de pêk werin.

Ev emeliyet li seranserê bakur û rojhilatê Sûriyê ya yekê ye. Emeliyan wiha li nexweşxaneyên Şam, Heleb û Himsê dihatin kirin. Bi wê re jî welatiyan pirsgirêka lêçûnê û êşa rêwîtiyê dikişandin.

Mîrateyeke malbatî... ji 50 salî ve mêşên bavê xwe xwedî dike

Ji 50 salî ve meşên hingiv li gel Ebdullah Hiso hene. Ew mêş ji bavê wî jê re man û bi navê "mêşên kurdî" bi nav dike. Hiso û hemsera xwe vê mîrateyê diparêzin û sûdê jê digirin.

Ebdullah Hiso (64) ji 50 salî ve ji bavê xwe fêrî xwedîkirina meşên hingiv bûye û hê jî parastina cureyên mêşên ku bavê wî jê re hiştine, dike. Êdî ev mêş bûne parçeyekî jiyana wî û çavkaniya debara malbatê.

Di nava civaka Kurd de, xwedîkirina mêşan ji kevneşopiyên civakî yên kevnar e. Lewre piraniya malbatan mêşan ji bo hingiv, tenduristî û derman, xwedî dikin.

"SÎNDOQÊN DARÎN"

Ebdullah Hiso mêşên xwe di sIndoqên darîn de li pişta mala xwe ya li gundê Abireyê yê navçeya Çilaxa ya kantona Qamişlo xwedî dike.

Hiso got; berê mêşên hingiv di qendîlên heriyê de xwedî dikirin, lê piştî pêşketina aboriyê êdî di qendîlên darîn de ku bi navê qendîlên çandiniyê tên naskirin xwedî dikin. Bi vê rêbazê vegu-hastin û vekirina wan hêsan dibe.

"HEVKARÎ"

Xwedîkirina mêşên hingiv baldariyeke zêde naxwaze. Lewre ew bixwe xwarin û ava xwe peyda dikin. Qendîlên xwe paqij dikin û kunên li qendîlan sererast dikin. Lê divê xwediyê mêşan di dema şilxdana wan de, wan bişopîne û bibe cihê ku xwarin û parastina wê guncaw be.

ebdullah û hemsera xwe mêşan xwedî dikin, bi hev re rewşa qendîlan dişopînin nexasim di mewsima zêdebûna wan ya salane de û parastina wan ji şilliyê dikin. Her du jî di warê xwedîkirina mêşan de pispor in.

Cara yekê ku Ebdullah Hiso mêş xwedî kirin, di 12`e saliya xwe de bû. Kêfxweşiya xwe di xwedîkirina mêşan de dît, lê îro bûye beşek ji jiyana wî û di xwedîkirina mêşan de bi hemsera xwe re dibe alîkar.

"MÊŞÊN KURDÎ"

Hiso da zanîn ku ew du cureyên mêşan xwedî dike, ew jî yên zer û qehweyî ne û ev her du cure wekî "mêşên kurdî" tên naskirin. Hiso wiha dawî li gotina xwe anî: "Cureyên mêşan ji herêmekê heta herêmekê cudatir in, ev cure jî ji beriya sedê salan di civaka kurdî de tên xwedîkirin. Ji ber wê navê wan bûye mêşên kurdî."

Çavkanî ANHA

Ezmûnêm demsala yekê dest pê kirin

Hediya HISÊN/Qamişlo



20 Çileya 2021ê Ezmûnên demsala yekê ya refa 12an li herêma Cizîrê dest pê kirin. 3 hezar û 500 xwendekar tevlî ezmûnan bûn.

Derbarê mijarê de Rêveberiya dibistana Mîşêl Selîba, Lava Îbrahîm wiha axivî: "Îsal sala şêpê ye ku li dibistanên herêma Cizîrê meteryalên refa 12an tên xwendin. Ezmûn wê hefteyekê dewam bikin. Saeta ezmûnan ji 8an heta 10 û nîvê ye. 62 xwendekarên me tevlî dibin. Pirsên ezmûnê ji aliyê desteya perwerde û fêrkirinê ve hatine amadekirin. Pirs li ser sê beşan hatine amadekirin; asta xwendekarên jîr, navî û lewaz. Ezmûn li 5 polan pêk tên. Li 3 polan her yek 14 xwendekar, li 2 polan jî her yek 11 xwendekar tên bicîkirin. Asta xwendekarên me baş e. Herwiha piştî qedandina dersên rojane, ji bo bilindkirina asta xwendekaran mamoste perwerdeya taybet û bêpere didin."

Lava Îbrahîm axaftina wiha qedand: "Ji ber ku ev sala yekê ye xwendekarên me bitirs in. Lê em bi wan re dibin alîkar û serkeftinê ji xwendekaran hemûyan re dixwazim."

Mistefa ji 60 salî ve pîşeyê berberiyê dike

Mistefa Elî Mistefa ji berberên herî kevin yên bajarê Kobanê ye û hê jî pîşeyû xwe didomîne. Mistefa Elî Mistefa (80) ji salên 1960`î heta roja îro şahidiya pêşketina civakê dike.

Mistefa Elî Mistefa di dikaneke êiçûk de pîşeyû xwe didomîne, lê dema çeteyên DAIŞ'ê (2014) êrişî Kobanê dikin, dikana wî dişewitînin. Ji dikanê dîwarên herifî yên bibin şahidên şerê li bajêr ten mane.

Mistefa Elî Mistefa di dema (1961) leşkeriya hikumeta Şamê de, fêrî berberiyê dibe. Ji wê demê ve 75 sal in bi vî pîşeyî malbata xwe xwedî dike. Mistefa digel temenê xwe yê mezin pîşeyê xwe didomîne

û hê jî çawbira xwe di berîka xwe de diparêze. Li ser cawbira xwe jî wiha got: "Ev alava nû ji ya kevnare pêşketîtir e, lê ji modelên nû yên di nava ciwanan de aciz im û nikarim çêkim. Ji ber wê pora extiyaran tenê çêdikim û bêhna xwe pê fireh dikim."

Mistefa Elî Mistefa ku li gel pîşeyê xwe ya berberiyê, fêrî pîşeyekî nû yê çêkirina kilîleyan jî bûye, wiha got: "Ez nû fêrî pîşeyê kilîleyan bûme, li kêleka berberiyê wî pîşeyî jî dikim."

Di dikanê de hin alavên kevin ku temenê wan 55 e mane.

Şaredariya Gel li gundewarê Dêrezorê dest bi avakirina stasyona avê kir

Şaredariya Gel li herêma El-Layiz ya rojhilatê Dêrezorê dest bi avakirina stasyona avê kir, ku wê avê bide 120 hezar kesî.

Şaredariya Gel li herêma El-Layiz ya girêdayî bajarokê Geranîc yê rojhilatê Dêrezorê, dest bi pêkanîna projeyê kir.

Xebata qonaxa yekê ya avakirinê dest pê kir û li gorî plansaziya şaredariyê wê proje 10'ê Sibatê bi dawî bibe.

Bi avakirina stasyonê re wê av bigihîje nêzî 120 hezar kesî û wê toreke sereke ji bo gihandina avê ji malan re bê dirêjkirin.

Ji aliyekî din ve, şaredarî xebata jinûve amadekirina stasyonên avê yên li bajarokê Geranîc didomîne da ku av bigihe tevayiya xetên avê yên li herêmê. Hêjayê gotinê ye ku Saziya Gîştî ya Ava Vexwarinê ya Dêrezorê zêdeyî 35 stasyonên avê serast kirin û av gihand tevayiya gundên Dêrezorê yên li ser çemê Firatê.

Şaredariyê herwiha 4'ê Çile dest bi avakirina stasyona avê li bajarokê Şeifa ya li rojhilatê Dêrezorê kir, ku avê digihîne 27 hezar kesî.

Kongreya Star: Emê têkoşîna xwe heta rizgarkirina Efrînê bidomînin

Koordînasyona Kongreya Star bi pêmana salvegera 3. ya dagîrkirina Efrînê got; em soz didin ku asta têkoşîn û berxwedana xwe bilind bikin da ku em Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî rizgar bikin, destkeftiyên şoreşê û ewleyiya Rojava biparêzin."

Koordînasyona Kongreya Star bi pêmana salvegera 3. ya êrişa artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li dijî kantona Efrînê daxuyaniyeke nivîskî da.

Daxuyanî wiha ye:

"Şêniyên herêma Efrînê li hemberî tang, top û balafirên dagirkeriya dewleta tirkî li ber xwe dan. Vê berxwedanê ji gundên li ber sînoran dest pê kir heta gihîşt nava bajêr û 58 rojan berxwedaneke dîrokî meşandin. Destanên qehremanî û dîrokî nivîsandin û mînakên wê jî berxwedana Avêsta Xabûr û Barîn Kobanê bûn.

Dewleta tirkî bê bikaranîna çekên giran û balafiran nikariya Efrînê dagîr bike. Bi êrişên xwe yên hewayî û erdê û bi dehhezaran çete Efrîn dorpêç kir. Li ber çavê dinyayê ev hovîtî hat kirin.

Gelê Sûriyê rastî hemû rengên êrişan hat, ji dizî, desteserkirin, xwînrijandin, kiryarên şer, hilweşandina şûnwarên dîrokî, birîna daran, guhertina demografiyê û qedexeya zimanê kurdî û bi darê zorê zimanê tirkî dan xwendin. Herêma berî dagirkeriyê herî zêde tê de aramî û ewlehî hebû Efrîn bû û tevahî koçberên Sûriyê yên ku di encama şeran de koçber bûn berê xwe didan Efrînê . Efrîn bi cudahiya xwe ya çandî û jiyana hevbeş navdar bû. Projeya Rêveberiya Xweser tekane riya çareseriyê bû ku Sûriya ji nijadperestiyî, olperestî, mezhebî û nijadperestiyê xelas bike. Ji ber vê yekê dewleta Tirk bi hemû rê û rêbazan hewl da dawiyê li projiya jiyana hevbeş û demokratîk bîne li herêmê.

Em hêzên navneteweyî şermezar dikin ku bi vê bêdengiya xwe destekê dide kiryarên dagîrkeriyê û qirkirina çandî, siyasî û guhatina demografî, koçberiya bi darê zorê ku di derheqê gelê Efrînê de tê kirin û kiryarên ku rojane tên kirin di der heqê welatiyan de. Em rêxistina Kongreya Star soz didin ku emê asta têkoşîn û berxwedana xwe bilind bikin da ku em Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî rizgar bikin, destkeftiyên Şoreşê û ewlehiya Rojava biparêzin û ta pêkanîna projeya neteweya demokratîk û jiyana hevbeş ji bo tevahî pêkhateyên herêmê, emê li ser piyan bin û xeta şehîdan bişopînin."

"Li warê xwe koçber im"

Leylan RESO/Qamişlo

Êrişa 18 Adara 2018. ya dewleta tirkî ya ser bajarê Efrînê, bû sedema koçberiya bi hezaran malbatan. Koçberî jî bû sedema çîrokên biêş. Tevî êşa dikişînin gotina koçberan her dem ev e: "Emê bi berxwedana xwe xaka xwe rizgar bikin."

"DI ŞERÊ EFRÎNÊ DE HEVJÎNÊ MIN BÊSERÛŞÛN ÇÛ"

Ji koçberên Efrînê Leyla Henan Mihened, li ser koçberiya xwe wiha axivî: "Bi destpêkirina êrişê re em çûn bajarê Serê Kaniyê. Em du heyvan li wir man. Hevjîna min li Efrînê li şaredariyê dixebitî. Di êrişê de bêserûşûn çû. Ji wê demê ve ti agahî jê nînin. Keçek û du kûrên min hene. Ji ber ku malabata hevjînê min dixwest zarokan ji min bistînin, ji Serê Kaniyê reviyam û min berê xwe da Dêrikê."

"PÊWÎSTIYÊN MIN BI CILÊN ERDÊ HEYE"

Leyla Mihemed di dewama axaftina xwe de wiha got: "Li Dêrikê ez û zarokên xwe li cem jineke bitemen bi cî bûn. Min kamp nas nedikir. Wê çûna kampê pêşniyarî min kir. Xelkê Dêrikê hinek cilên kevin ji zarokên min re anîn û heta niha jî bi wan cilan in. Pêdiviya me bi cilên erdê heye. Tişta ku rêveberî dide me ez difiroşim û ji zarokên xwe re xwerek dikirim. Ji bilî rêveberiya kampê ti kes serî li me nade ka em sax in yan mirî ne."

"HEVGRTINA GELAN SERKEFTINÊ TÎNE"

Leyla Mihemed di dawiya axaftina xwe de hestên xwe wiha anîn zîman: "Çima cîhan tev, li me bûye yek? Berî niha em ji ber çeteyên DAIŞ`ê ji malên xwe derketin û çeteyan mal û milkên me talan kirin. Niha jî çeteyên dewleta tirkî bajarê me dagîr kirin û keda me ya salan hilweşandin. Ma wê heta kengê em di binê êrişan de bin? Xwesteka malbatên koçber tevan ew e ku vegerin bajarê xwe. Lewra ti dever ji mal û bajarê mirov, xweştir nînin. Bi berxwedana YPJ-YPG û QSD`ê û hevgirtina gelên herêmê, emê bi ser bikevin."

"Koçberî ne bes bû bi ser de êşa zarokên min"

Darîn SILÊ/Qamişlo

Êrişa 9ê Cotmeha 2019an ya dewleta tirkî ya ser bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî bû sedema koçberiya bi dehhezarên malbatan. Ev êriş bû sedem ku xelkê her du bajaran neçarî koçberiyê bibin û ji mal û milkên xwe dûr bikevin. Lê Tevî zor û zehmetiyan hê jî li ber xwe didin.

DI KOÇBERIYÊ DE ME ZEHMETÎ PIR KIŞAND

Li ser mijarê koçbera bi navê Emîne Ebdilezîz li ser jiyana xwe ya koçberiyê wiha axivî: "Em ji gundê Ebû Fixêz yê bajarê Serê Kaniyê ne. Ji ber xizaniyê berî dagirkirina Sere Kaniyê bi sê salan ji bo ka rem çûn bajarê Yebrûdê yê nêzî Şamê. Lê rewşa me li wir jî ne baş bû. Ji ber wê em neçar bûn vegerin bajarê xwe. Lê dewleta tirkî ya dagîrker êrişî bajarê me kiribû û tev dagîr kiribû. Ji ber wê em neçarî koçberiyê bûn û li kampa Newroz bi cih bûn."



û parastina vê xakê kirin. Ji bo parastina mafê jinan, mîna YPJê li Bêt Nehrên Yekîneyên Parastina Jinên Suryan ava kirin. Pêwîstiya me bi xweparastinê heye, lewre ji 1915an ve li ser gelê me yê Asûr, Suryan û Kildan êriş û qirkirin dewam dikin. Ji ber wê jinên Suryan jî bi awayekî çalak tevlî hêzên parastinê bûn."

Ebîr Îliya axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Ji bo hevgirtinê û berxwedana li hemberî dagirkeriya dewleta tirkî, ez spasiya tevayiya gelan dikim û ji gelên bakur û rojhilatê Sûrî re serkeftinê dixwazim."

Rêveberiya Xweser bi biratiya gelan bi ser ket

Jiyan BOZO/Qamişlo

7 sal di ser avakirina Rêvberiya Xweser re derbas dibin. Tevî dagîrkeriyê, zehmetiyên jiyanê û hişmendiya mêr ya serdest, jinên bakur û rojhilatê Sûriyê bi Asûr, Suryan, Kurd û Erebên xwe ve, di Rêveberiya Xweser û di her qada jiyanê de bûn xwedîrol û ji tevayiya jinên cîhanê re bûn mînaka jina azad.

"JI CÎHANÊ TEVÊ RE BÛ MÎNAK"

Têkildarî mijarê Cîgira Hevserokatiya Têkiliyên Derve Ebîr Îliya ev nirxandin kir: "Îro (21.01.2021) salvegera 7an ya avakirina Rêveberiya Xwese li herêma Cizîrê ye. Ji bo gelên bakur û rojhilatê Sûriyê ev gava destpêkê bû. Vê rêberiyê gelek zor û zemetî dîtin û rastî gelek êrîşên hêzên hegemonîk û dethilatdar hat. Ji tevayiya gelên herêmê bi hezaran şehîd û birîndar çêbûn. Ev rêveberî, di serî de keda şehîd û birîndaran, bi ked û xebata gelan (Kurd, Ereb, Suryan, Asûr û Kildan) bi ser ket. Ev rêveberî ji rejima Sûrî re ku gelê herêmê di nava pencên DAIŞê de hişt, bersiva herî xurt bû. Rejimê dixwest pêşiya hevgirtina gelên herêmê bigire. Lê Rêvebriya Xweser bi vîna gelan 7 sal in ji cîhanê tevê re bûye mînak. Jinên bakur û rojhilatên Sûrî di avakirina rêveberiyê de xwedîrolekî mezin bûn. Destpêkê di rêveberyê de rêjeya jinan %30 bû. Lê niha %50 zêdetir e. Vê reberiyê herwiha di pêşketina civakê û saziyên wê de gavên mezin avêtin."

"EM JI GELÊN BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRÎ RE SERKEFTINÊ DIXWAZIN"

Ebîr Îliya axaftina xwe wiha domand: "Em gelê Suryan û Partiya Yekîtiya Jinên Suryan, hem di avakirina rêveberiyê, hem di nava tavayiya sazî û destêyên rêveberiyê de me cî girt û ji civakên din re em bûn pêşeng. Jinên Suryan herwiha tevlî hêzên leşkerî jî bûn

Komara Kurdistanê ya Mehabadê; ezmûneke dîrokî ya birûmet

Ezmûna damezirandina Komara Kurdistanê ya Mehabadê li rojhilatê Kurdistanê, yek ji pêvajoyên birûmet yên dîroka têkoşîna rizgarî û azadiya gelê Kurd e. Herwiha geşedanên di pêvajoya damezirandin û têkçûna komarê de jî ji bo têkoşîna gelê Kurd ya demên pêş bûye ezmûn û dersên girîng.

Rojhilatê Kurdistanê, piştî bakurê Kurdistanê parçeyê Kurdistanê yê herî mezin e û çar parêzgehên rojavayê Îranê digire nava xwe; Azerbêcana Rojava, Mehabad, Kirmaşan û Îlam. Piştî Peymana Qesra Şirîn sala 1639'an ket binê dagîrkeriya Sefewiyan, herwiha ji destpêka sedsala 20`an ve jî di binê dagîrkeriya Îranê de ye

REWŞA SIYASÎ YA BERIYA RAGIHANDINA KOMARA KURDISTANÊ YA MEHABADÊ

Berî Şerê Cîhanê yê Yekê têkiliyên dostayî û hevkariyê di nabera Almanya û Îranê de hebûn, ji berwê, wê demê dewletên hevpeymanê guman dikirin ku Îran di şer de piştgiriya Almanya bike. Jixwe armanca sereke ya dewletên hevpeymanê jî ew bû ku xwe bigihînin çavkaniyên petrolê yên welatên Ereban, Kurdistan, Îran û Azerbêcanê. Di sala 1941`ê de Brîtanyayê herêmên rojavayê Îranê dagîr kirin û zext li desthilatdarê Îranê Riza Şah kir ku dev ji desthilatê berde. Piştî wê Brîtanya li Kirmaşanê bi cih bû. Yekîtiya Sovyetê jî herêmên bakur û rojavayê Azerbêcanê dagîr kirin. Her du hêzên dagîrker xwestin ku li herêmên kurdî valayiyek çêbe, bi taybetî herêma Mehabad heta Seqizê ku di binê desthilata Sovyetê de ne û ji derveyî desthilata hêzên Îranê bû.

GEŞBÛNA DAXWAZIYÊN KURDAN YÊN SIYASÎ

Lîderên Kurdan yên wê herêmê hewl dan ku xwe nêzî Brîtanyayê bikin ji bo mafên xwe yên siyasî bistînin, lê Brîtanya xwe da aliyê hikumeta Îranê û mafên Kurdan nepejirand. Lewma Kurd neçar man ku berê xwe bidin Yekîtiya Sovyetê. Sovyet jî der barê mafên Kurdan de dudil bû, lê ji ber hin sedemên siyasî ji lîderên Kurdan re got em piştgiriya mafên Kurdan dikin ku çarenûsa xwe bi xwe pêk bînin.

RAGIHANDINA KOMARA KURDISTANÊ YA MEHABADÊ

Roja 22`yê meha Çile ya sala 1946'an li qada Çarçira ya bajarê Mehabadê, Qazî Mihemed damezirandina Komara Kurdistanê ya Mehabadê ragihand. Di şahiya ragihandinê de hejmareke mezin welatî, serokên eşîran û oldarên Kurd beşdar bûn. Cara yekê ala kurdî hat hildan. Nûnerên hemû êl û eşîran hatin hilbijartin û Qazî Mihemed bû serokê Komara Mehabadê. Li navenda bajarê Mehabadê Qazî Mihemed axaftinek kir û got: "Gelê Kurd neteweyek e ku welatê wî hatiye dagirkirin û parçekirin, mafên wî jê hatine standin û doza wî nehatiye çareserkirin. Kurd îro ji xewê şiyar bûne, dostên wan ên bi hêz hene. Di vê kêliyê de va ye komareke otonom hatiye avakirin. Komar ne ji bo parçebûnê ye, lê ji bo ku siyasetên Tehranê yên li dijî gelê Kurd bêne rawestandin."

DI DEMEKE KURT DE DESTKEFTIYÊN DÎROKÎ

Di pêvajoya temenê komarê de ku salek derbas nekir, destkeftiyên dîrokê di hêla siyasî, çandî, rêveberî û leşkerî de pêk anîn:

• Hêzên pêşmergeyan ava kirin.

• Cara yekê ala kurdî hat hildan. Ala kurdî ji rengê sor, spî û kesk pêk dihat, di nîv wê de jî sembola komarê hebû, sembol jî ji pênûs û du sinbilên genim pêk dihat.

• Di hêla çandî û zanistî de geşedanên mezin pêk hatin, pir rojname û kovar hatin çapkirin, weşanxane hatin avakirin û Çapxaneya Kurdistanê jî hate avakirin.

• Dezgeha radyoya û sînemaya gerok hatin avakirin.

• Sirûda neteweyî ya komarê hat nivîsîn.

• Beşdariya jinan bihêz bû, cara pêşî yekîtiya jinan li Komara Mehabadê hat damezirandin.

• Dibistan hatin vekirin û zimanê kurdî bû zimanî fermî, her wiha ji bo nifşên mezin dibistanên danê êvarê hatin vekirin.

• Pêşxistina hunera şanogeriyê.

YEKÎTIYA SOVYETÊ PIŞTA XWE DA GELÊ KURD

Tevî ku Yekîtiya Sovyetê wek alîgirê yeke yê tevgerên rizgariya neteweyî yên sedsala 20`an bû, herwiha tevî ku Sovyetan soz dabû Kurdan ku piştgiriya mafên wan ê çarenûsê bikin, lê vê carê jî dîse bazara berjewendiyên navdewletî bi ser ket. Wê demê derdê Sovyetan ew bû ku xwe bigihînin petrola herêmên bakurê Îranê. Ew derdê wan bi cih bû. Piştî ku Sovyetan armancên xwe pêk anîn, biyar dan ku hêzên xwe ji Îranê vekişînin. Di Gulana sala 1946`an de dest bi vekişîna hêzên xwe kir û Kurd li pêşberî hêzên Îranê tenê hiştin. Gelê Kurd careke din bû qurbana berjewendiyên navdewletî.

HILWEŞÎNA KOMARÊ

Piştî ku Sovyetan hêzên xwe ji Îranê kişandin, du rê li pêşiya lîderên Kurdan mabûn; an wê li ber xwe bidin an teslîm bibin. Serokê Komara Kurdistanê ya Mehabadê Qazî Mihemed û çend lîderan biryara berxwedanê dan lê hin lîderên din xwe paşde kişandin û teslîm bûm. Di nava wan de Barzanî jî hebû ku wê demê stûna hêza leşkerî bû û di destê wî de gelek çek û cebilxane hebûn.

Roja 17`ê Çileya sala 1946`an artêşa Îranê berê xwe da Komarê û li dijî Kurdan komkujî û terorek mezin pêk anîn. Wê demê Barzaniyan tevî hêza xwe ya çekdar li rojava nêzî bajarê Mehabadê bi cih bûbûn. Di destê wan de 3 hezar tifingên nû, 120 top hebûn, lê hêzên Îranê nêzî wan nebûn.

Roja 30`ê Adarê serokê Komara Kurdistanê ya Mehabadê Qazî Mihemed û her du birayên wî Sêf û Sedir hatin bidarvekirin. Bi vî awayî dawî li Komarê hat.*Çavkanî/ANHA*

"Dem dema parastina şoreşê ye"

Lêzan EBDIKÊ/Qamişlo

Bi pêmana salvegera 3. ya dagîrkirina Efrînê, bi slogana "Dem dema parastina şoreşê ye" li seranserê bakur û rojhilatê sûriyê, çalakî hatin lidarxistin û dagîker hatin şermezarkirin.

RASTIYA DAGÎRKIRINA EFRÎNÊ

Têkildarê mijarê nûnera rêveberiya xweser ya li Ewropa, Mizgîn Ehmed wiha axivî: "Dagîrkirina Efrînê ket sala çaran lê hêzên rizgakirina Efrînê bênavber çalakiyan dikin. Efrîn bi lihevkirina Rûsya, Tirkiye û rejima Sûriyê hat dagîrkirin. Lê şere li ser Efrînê pir giran bû. Li hemberî devereke ewqas piçûk bi dehan balafir, tang û top hatin bikaranîn. Dewleta Tirkî bi 72 balefiran êrişê Efrînê kir."

Mizgîn Ehmed axaftina xwe wiha domand: "Ev planeke navneteweyî bû. Sê sal di ser dagîrkirinê re derbas bûn. Eger di nava Kurdan de xayîn û hevalbendên dijmin tinebûna, Efrîn nedihat dagîrkirin. Sedema din ya dagîrkirina Efrînê pergala rêveberiya xwser bû. Lewre dagîrker tehemûl nakin ku Kurd xwe bi rê ve bibin. Sedema sisiyan û ya sereke jî dewleta tirkî hebûna gelê Kurd qebûl nake, bi vê êrişê xwest Kurdan qir bike."

"EFRÎN YA EFRÎNIYAN E"

Mizgîn Ehmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Em Rêveberiya Xweser dibêjin; dem dema rêzgarkirinê ye. Em bi ruhê israrê tevlî kar bûne û sal bi sal israra me zêde dibe. Gotineke efrîniyan heye, dibêjin; "Efrîn ya Efrîniyan e û soza vegerê ye." Em jî soza vegerê didin. Temenê dagîrkirinê çi dibe bila bibe, em nahêlin dagîrker bi rehetî li ser xaka Efrînê bijîn. Lê ne Efrîn tenê her wiha Serê Kaniyê û Girê spî jî. Em bostek axa xwe ji dagîrkeran re nahêlin."

TEV-DEM: Şêniyên Efrînê li hemberî du karesatên rêxistinkirî rûbirû ne

TEV-DEM`ê bi pêmana salvegera 3. ya êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li dijî Efrînê daxuyaniyek da û banga tekoşîna li dijî dagîrkeriyê kir. TEV-DEMê sûcên li dijî şêniyên Efrînê dibin bi du karesatên rêxistinkirî bi nav kirin. Yek ji aliyê artêşa tirkî, ya din jî ji aliyê hikumeta Şamê ve ye û ev agahî dan: "Karesata yekê di hundirê Efrînê de dibe û hewldana qirkirina komî û etnîkî tê kirin. Ya din jî li dijî koçberên li kampên Şehba dibin. Digel topbarana dewleta tirkî hikumeta Şamê jî dorpêç kirine. Her du alî ji bêdengiya navneteweyî sûdê digirin."

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin:

"Bi destpêka sala 2018`an re û di encama lihevkirinên navneteweyî de, herêma Efrînê û gelê wê bi êrişên artêşa tirkî yên hewayî û bejayî re rûbirû ma. Her wiha bi hevkariya komên çeteyan di êrişa yekê de 72 balafirên şer bi kar anîn. Armanc ji dagîrkirina herêmê, parçekirina xaka Sûriyê û tevlîkirina erdê Tirkiyê ye. Li aliyekî din jî ev êriş bi armanca şkandina vîna pêkhateyên herêmê û destkeftiyên wan yên avakirina saziyên xwe yên demokratîk bû.

Di pêvajoya 3 salên derbasbûyî de li Efrînê bir her awayî sûc hatin kirin. Bi vê yekê pîvanên navneteweyî hatin binpêkirin. Sûcên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên li Efrînê dikin em projeyeke herî bixeter dibînin. Ev weke destpêka pêkanîna plan û projeya Mîsaka Mîllî ye. Ev rasterast terör e. Şêniyên Efrînê 58 rojan li ber xwe dan, parastina herêmê û nirxên xwe kirin. Li dijî dewleta 2. ya NATO rabûn. Ji ber wê ev berxwedan bi Berxwedana Serdemê" hat binavkirin. Gelê Efrînê li hemberî dewleteke xwediya çekên giran û teknîka herî pêşketi li ber xwe dan. Ji ber wê şêniyên Efrînê neçar kirin ku di nava du karesatan de bijîn; ya yekê di hundirê Efrînê bixwe de tê meşandin ku ew jî hewldana qirkirina komî û etnîkî ye û li dijî sîvîlan sûcên revandin û destdirêjiyê pêk tînin. Ya 2. jî li dijî koçberên li kampên Şehbayê tê meşandin e ku ew jî bi topbarana dewleta tirkî û siyaseta dorpêçkirinê ya ji aliyê hikumeta Şamê ve ye.

Em TEV-DEM bang li tevayiya saziyan, rêxistinên civaka sîvîl, rêxistinên navneteweyî yên parastina mafên mirovan, rêxistinên taybet bi karên jinan û raya giştî dikin ku têkildarî sûcên derexlaqî û dermirovî helwesteke cidî nîşan bidin.

Bîlançoya 2 mehan ya êriş û berxwedana li Eyn Îsa

Bîlançoya du mehan ya êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser navçeya Eyn Îsa û berxwedana QSD'ê ya li hemberî êrişan eşkere bû. Agahiyên bîlançoyê xwe dispêrin fermandarên leşkerî û berpirsên Rêveberiya Xweser.

Piştî 7 hefteyan ji êrişên bênavber yên li dordora bajarokê Eyn Îsa, ji 12'ê Çile ve bêdengî heye.

Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê 23'ê Mijdarê bi çekên giran dest bi êrişî navçeya Eyn Îsayê kirin. Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ragihand ku bersiva êrişan dane û nehiştine çete bigihin riya M4 a di navbera Eyn Îsa û kantona Kobanê de.

'HEWLDANÊN DORPÊÇKIRINA EYN ÎSAY BI SER NEKETÎN'

Ji fermandarên QSD'ê Ciwan Ayhan yê li eniyên Eyn Îsa ragihand ku şervanên wan li hemberî hewldanên dewleta tirkî û çeteyên wê yên gihîştina riya M4 berxwedaneke mezin kirine. Ayhan diyar kir ku hebûna hêzên Rûsya ya garantor û hêzên hikumeta Şamê li eniyên şer bêwate ye, dema ku şer giran dibe her alî vedikişe. Şervanên me jî nîşan dan ku em ji parastina xaka xwe gavê paş ve navêjin, bi dehan dagirker hatin kuştin û cenazeyên wan li nêzî riya M4 belav bûn."

WÎNDAYÎYÊN DAGÎRKERAN

Li gorî agahiyên ji fermandarên QSD'ê hatîn girtin, di van êrişan de 65 leşker û çeteyên dewleta tirkî hatine kuştin û 53 jî birîndar bûne. Herwiha 5 makîne û erebeyên leşkerî yên dagîrekran hatine roxandin. QSD'ê di demên cuda de navên 9 şervanên xwe yên di bersivdayîna êrişan de şehîd bûyîn, ragihandibûn.

SÎVÎL KOÇBER BÛN Û TEVGERA RIYA M4 RAWESTÎYA

Ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê ji 6 gundan sîvîl ji malên xwe koçber bûn, li taxên bakur û başûrê bajarok gelek mal roxiyan. Di heman demê de ji ber şerên li derdora gundê Mişêrfê, çalakiya bazirganî û tevgera çûnhatinê ya li ser riya M4 ya di navbera Eyn Îsa û Til Temirê de mehekê rawestiya.

Di roja salvegera 3. ya dagîrkirina Efrînê de xelkê herêma Cizîrê daket qadan

Bi pêmana salvegera 3. ya destpêkirina êrişan li dijî kantona Efrînê ji hêla artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê ve, xelkê bajar û navçeyên kantona Qamişlo û Hesekê yên herêma Cizîrê daketin qadan

Welatiyên herêma Cizîrê ji bo şermezarkirina êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên 20`ê Çileya 2018`an li dijî Efrînê pêk anîn û di encamê de kantona Efrînê hat dagîrkirin, meşên girseyî li dar xistin.

QAMIŞLO

Şêniyên Qamişlo bi vê pêmanê ji kolana Munîr Hebîb ya li beşa rojavayê bajêr heta avayiya Komseriya Bilind ya Neteweyên Yekbûyî ya Kar û Barê Penaberan ya li Qamişlo meşiyan.

Nûnerên gelek saziyên bajêr tev li meşê bûn. Xwepêşandêran şaxên darên zeytûnan, wêneyên zarokên Efrînê yên ku sûcên dagîrkeriya tirkî yên li dijî wan xuya dikin û pankartên "Wijdana mirovayiyê li kû derê ye", "Qçrîna zarokên Efrînê bibihîzin" û Zarokên Efrînê xilas bikin" hildan.

Meş li ber avayiya Komseriya Bilind a Neteweyên Yekbûyî veguherî mitîngê. Di mitîngê de endamê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Qamişlo Îsam Îbrahîm û endama rêveberiya PYD şaxê kantona Qamişlo Semîre Mihemed axivîn. Meş bi sloganên silavkirina berxwedana Efrînê bi dawî bû.

TIRBESPIYÊ

Bi dehan pêkhateyên navçeya Tirbespiyê yên Kurd, Ereb û Suryan meşiyan û bang li civaka navneteweyî kirin ku li hemberî sûcên dewleta tirkî yên ku li Efrînê rojane pêk tên, berpirsyariyên xwe bînin cih.

TIL HEMÎS

Di heman çarçoveyê de, şêniyên Til Hemîs li pêşiya Navenda Tirafikê kom bûn û dest bi meşê kirin. Meş li Qada Şehîdan a li nava navçeyê rawestiya. Welatiyan di meşê de pankartên ji bo şermezarkirina êrişên li dijî Efrînê û dagîrkirina wê ji hêla artêşa tirkî ya dagîrker ve hildan.

TIL BAREK

Şêniyên navçeya Til Berak ji bo şermezarkirina dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê li dijî Efrînê derketin xwepêşandanê.

Xwepêşandan ji pêşiya çerxerêya firneya navçeyê dest pê kir, xwepêşandêran pankartên " Na ji dagîrkeriya Efrînê re", " Dem dema azadiyê ye ", " Efrîn destan û sirûda azadiyê ye ", "Efrîn çirûska azadiyê ye " û wêneyên şehîdên li Efrînê hildan.

GIRKÊ LEGÊ

Bi sedan şêniyên navçeya Girkê legê ya kantona Qamişlo ji bo şermezarkirina êrişên dewleta tirkî yên li dijî Efrînê xwepêşandan li dar xistin.

Xwepêşandêran wêneyên şehîdên di berxwedana Serdemê de şehîd bûyîn û şaxên darên zeytûnan hildan û siloganên ku berxwedana Efrînê silav dikin û sûcên dewleta tirkî şermezar dike, hildan.

TIL KOÇER

Şêniyên navçeya Til Koçer jî meşek li dar xistin û bi sedan şêniyên navçeyê, endamên saziyên sîvîl û Hêzên Ewlekariya Hundir tev li meşê bûn.

DÊRIK

Bi hezaran pêkhateyên Dêrikê, nûnerên partiyên siyasî, rêxistinên jinan û saziyên civaka sivîl li pêşiya navenda Saziya Malbatên Şehîdan kom bûn û bi armanca şermezarkirina dewleta tirkî ji Efrînê re meşek li dar xistin.

AMÛDÊ

Li navçeya Amûdê jî meşekê ji pêşiya qada Jina Azad dest pê kir û ber bi qada Şehîd Cîhad ya li navenda navçeyê ve çû. Di mitînga piştî meşê de axaftin hatin kirin.

DIRBÊSIYÊ

Bi heman armancê, bi hezaran şêniyên navçeya Dirbêsiyê û gundewarê wê xwepêşandanek li dar xisitn. Xwepêşandêran wêneyên şehîdan rakirin.

HESEKÊ

Bi hezaran pêkhateyên bajarê Hesekê û koçberên kampa Serê Kaniyê li dijî dagîrkirina Efrînê ji aliyê artêşa tirkî ya dagîrker ve, du xwepêşandanên cuda li dar xistin.

KAMPA WAŞOKANÎ

Li Kampa Waşûkanî jî, Kongreya Star bi hevkariya meclisa kampê bi durişma "Ji dagîrkeriya tirkî re, dem dema parastina şoreşê ye" xwepêşandanek li dar xist.

Greva birçîbûnê di roja 59. de bi biryardariyeke xurt didome

Greva birçîbûnê ya ji bo şkandina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û şkandina zordariya li zindanan hatî destpêkirin, di roja 59. de didome û girtî di çalakiya xwe de bi biryar in.

Greva birçîbûnê ya ji bo şkandina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û bidawîkirina zordariya li girtîgehan, ya 27`ê Mijdarê ji aliyê girtiyên ji doza PKK û PJAK'ê ve hatî destpêkirin, di roja 59. de dewam dike.

Girtî diyar dikin ku li gel zordariyê heta tecrîd bi dawî nebe wê bi biryardarî çalakiya xwe bidomînin û bang li gel jî dikin ku li çalakiyê xwedî derkevin.

GREVA BIRÇÎBÛNÊ LI MEXMÛRÊ DI ROJA 38, DE YE

Li wargeha koçberan ya şehîd Rustem Cûdî (Mexmûrê) jî li dijî tecrîda li Îmralî, bi pêşengiya jinan 18'ê Kanûnê, çalakiya greva birçîbûnê hat destpêkirin. Çalakî li Komeleya Malbatên Şehîdan ya Mexmûrê di roja 38. de dewam dike. Şêniyen wargehê di çalakiya xwe de bi biryar in û dibêjin, heta tecrîd neyê şkandin em dev ji çalakiya xwe bernadin.

"Ji dagîrkeriyê re na, dem dema parastina şoreşê ye"

Hediya HISÊN/Qamişlo

Bi durişma "Ji dagîrkeriyê re na, dem dema parastina şoreşê ye" Meclisa Malbatên Şehîdan bi pêmana salvegera 3. ya dagîrkirina Efrînê li bajarê Qamişlo meşek li dar xist.

20/1/2021 li bajarê Qamişlo saet 11. bi pêşengiya Mclisa Malbatên Şehîdan meşek hat lidarxistin. Meşê ji taxa Mûnîr Hebîb dest pê kir û heta taxa siyahî (Cihê UN) dewam kir. Gelek desteyên Rêveberiya Xweser tevlî meşê bûn û banga piştgirî û rizgarkirina Efrînê kirin.

Di çalakiyê de ji rêveberiya gumrikê Narîşan Efrîn wiha axivî: "3 sal in Efrîn dagîrkirî ye. Îro rojeke reş e ji bo me. Armanca dewleta tirkî ya dagîrker şkandina vîna gelê Kurd e. Lê em ji dagirkeran re dibêjin ew gelê 58 rojan li hemberî tank, top û balafirên we li ber xwe dayî, vîna wî ti carî nayê şkandin. Efrîn ya me ye ne ya dagîrkeran ne. Efrîn ti carî nakeve emê xaka xwe rizgar bikin."

Endamê Meclisa Malbatên Şehîdan Mihyedîn Hesen wiha axivî: "Îro roja xemgîniya gelê Kurd e. Koçberiya Efrînê êşeke mezin dide me. Lê wê xewn û xeyalên dijmin ti carî pêk neyên û emê Efrîna xwe rizgar bikin. Emê bi hêza gelê xwe bi ser bikevin.

Ji koçberên Efrînê rojnemevan Nûrhat Hesen jî wiha axivî: "Dewleta tirkî ya dagîrker dixwaze împaratoriya Osmanî

vegerîne. Dibêje eger konekî Kurdan li bakurê Afrîka jî hebe ezê tine bikim. Lê dema dît ku projeya rêveberiyeke xweser û demokratîk bi destê Kurdan çêdibe, xwest pêşiya vê projeyê bigire û erdê me dagîr bike. Lê bi ser nakevin, çimkî gelê me bi vîn û hêza xwe bawer e. Hêzên navneteweyî çavê xwe ji hovîtiya dewleta tirkî re digre. Lê emê bi kamera û pênûsa xwe vê hovîtiyê nîşanî cîhanê bikin. Baweriya me heye û emê li xaka xwe vegerin. Çi gelê bi bawerî û vîn be wê vegere xaka xwe."